# DİPLOMAT

№ 09(034) 01-15 İyun, Hezêran 2006

İctimai-siyasi qəzet
Rojnama civakî û sîyasî

Qiymətі
Hêjaye
20 qəpik


## Serokê Kurdistanê: Emê ji bo avakirina sazîyan pêşevan bin



-Bi beşdariya rêzdar Mesûd Barzanî serokê Kurdistanê, sekreter, hejmareka endamên Polîtbîro, Komîteya Navendiya PDKê, xwendekar, mamostê û hejmareka mêhvanan, di salvegera pêketina şoreşa Gulana pêşketinxwaz de Fêrgeha Kadroyan şahiya qedandina kursa xwe ya pazdê li dar xist.

Berahiya şahîyê bi rêzgirtina li canê şehîdên Kurdistanê dest pê kir û piştre serok Barzanî di peyvekê de tevî destxweşiyê, qedandina kursê li xwendekar, mamosteyan pîroz kir û hêvî xwest ku agahdariyên ji kursê girtine, ji bo xizmeta gelê xwe bi kar bînin. Ça serok Barzanî salvegera bîranîna şoreşa Gulana pêşketinxwaz li kurdistaniyan pîroz kir. Di beşeka din ya peyva xwe de serok Barzanî yên ku ev kurs qedandine ji rewşa îroya Îraqê, Kurdistanê haydar kirin, bi hûrî jî ronî da ser pêşhat, bûyer û pêşdeçûnên berîya operasyona azadkirina Îraqê û piştî azadkirinê jî kû tê de kurd wek yek ji stûnên herî girîng yên hemû prosesê û guhertinên çê bûne, cî digire.

Bisazîkirina dezgehên Kurdistanê yek din ji aliyên peyva serok Barzanî bû û mijûlbûna serokatîya sîyasî û xelkê Kurdistanê jî bi wî awayî berçav kir ku wek çewa em berê di tekoşînê de pêşevan bûn, divê ji bo bisazîkirina dezgehan jî pêşevan bin.

## Celal Talebanî ji dewletên ereban ne razî ye



Serokkomarê Îraqê Celal Talebanî duh gilî û gazindê ji dewletên ereban kir ku wan heta niha şandên xwe nehinartine Bexdayê bo pîrozbahîkirinê li hikumeta nu ya zsaqê û wan wekî serokwezîrê Brîtanî Tony Blaîrî nekir.

-Celal Talebanî ev nerazîbuna xwe ji helwesta hikumetên ereb li hember hikumeta nu ya Îraqê duh di konferanseka rojnamevanî de li Bexdayê ragîhand. Wî got ku têlêfona sekreterê giştî yê yekitîya dewletên ereb Emr Musayî kir û jê re got:

-Ne tişteke normal e ko serokwezîrê Brîtanyayê û wezîrê derve yê Îranê bên Îraqê bo pîrozbahîkirinê li hikumeta nu ya Îraqê û ereb paşde bimînin.

## Serdana yekê ya berpirsekê hikumeta nu ya Îraqê bo Kurdistanê



-Li serokatîya Civata Wezîrên Kurdistanê li Hewlêrê Nêçîrvan Barzanî serokê Hikumeta Kurdistanê Dr.Berhem Salih cîgirê serokwezîrê Îraqê û hejmarêka endamên lîsta Hevpeymanîya Kurdistanê di prêskonfransekê de li ser giftûgo û danûstandinên dawîn yên hikumeta Kurdistanê û Bexdayê rawestîyan.

(dûmahi rûpela. 5)

## Name, ji Kurdistana pîroz



Kurdistan Regional Government
Council of Ministers
The Prime Minister

حکومەتی هەرێمی کوردستان
ئەنجوومەنی وەزیران
سەرۆك وەزیران

Berezan Tahir Sileman u Egid Cerkes

Sılav u Réz....

Nameya pirozbahiya we biréz gihişt, ez sipasiya Hestén we yén bilind dıkim. Hıkumeta Heréma Kurdıstané beré keda mılleté meye. Erké parastın u geşé pékırına wé, lı ser mılé me hemûyane.

Em dılniyane ku hemû dılsozén gelé me, kesén Demukratxwazén Astixaz , bı hemaheng lı gel hıkumeté da bi xebitin, da ku paşerojeka geştır bo mılleté me pékbinın.

Careka dın Sipasiya hewe dıkem,
u lı we jı piroz be.

Nécirvan BARZANİ
Seroké Hıkumeta Heréma Kurdıstan

## Jinên ereb nizanin ko kurdî jî zimanê resmî yê Îraqê ye



-Xatûna serokkomarê Îraqê Hêro Îbrahîm Ehmed 23-ê vê mehê li Londonê di kongrêyeka jinan de beşdar bu û wê tê de axiftina xwe li ser rewşa jinên Kurdistanê û Îraqê bi zimanê kurdî kir. Ev kongrê her salê carekê li Londonê bo jinên dewletên erebî û yên rojhilata naverast têt kirin.

Jinên ereb ji axiftina wê ya bi kurdî ya di kongreyê de aciz bun û li gor wan ji ber ko piranîya xelkê Îraqê ereb in divêt jina serokkomarê Îraqê bi erebî biaxive. Van jinan ji bîr kir ko di destura Îraqê de zimanê kurdî bi qeda zimanê erebî zimanê resmî yê Îraqê ye.

## Mihemmed Îhsan: 68 hezar ereb dixwazin ji Kerkûkê derbikevin



Səh. 2

## LAÇIN DƏRDİ, LAÇIN HƏSRƏTİ...

Təbiətin ən füsünkar gözəlliyini özündə cəmləşdirib, xüsusi bir ecazkar cazibəyə malik olan, kiçik Qafqaz dağlarının qartallar oylağı olan İşıqlı dağının ətəklərində, Laçın rayonunun Kamallı adlı bir kürd kəndi yerləşirdi. Ərazisi 1900 ha çatan bu kəndin təsərrüfatı 180-ə, əhalisinin sayı isə 2000 nəfəri ötüb keçmişdi. Əhalinin əsas məşğuliyyəti heyvandarlıq və əkinçilik idi.

Səh. 7

## NGO-yên Kurdistanê bi çendîn daxwazan çûne parlementoya Kurdistanê



Səh. 2

# QALİB DAĞ GENERALI-BARZANİ


Əmrəl Ləhrudi

**Müsahibim 1946-cı ildə Pişəvəri ilə birlikdə Azərbaycana gələn, hazırda ADF-si MK-sının sədri Əmrəl bəy Ləhrudidir.**

**-Əmrəl müəllim xahiş edirik Molla Mustafa Barzani haqqında xatirələrinizi danışasınız.**

Molla Mustafa Barzaninin qəhrəmanlığı haqqında, istər o tayda, istərsə də bu tayda çox eşitmişdim.O, bütün döyüşlərdən qalib çıxırdı, çünki onun peşmərqələri könüllü ona qoşulmuşdular və hamısı da çalışırdı ki, ondan qabaq döyüş meydanına atılsın. Onların bu cür döyüş taktikası hər zaman düşməni qaçmağa məcbur edirdi. Peşmərqələr ölümü özlərinə şəraf bilirdilər.

SSRİ-nin xəyanətindən sonra Pişəvəri Molla Mustafa Barzanini eşitmədi Bakıya gəldi və gəldiyi gündən də gəlməyinə peşiman olmuşdu. Geri qayıtmaq planı üzərində işləyib partizan hərəkatı başlatmaq istəyirdi. Ona görə Mahabada adam göndərdi. Lakin, gec idi. Molla Mustafa Barzani 1947-ci ildə Təbrizdə olan Sovet konsulxanasına müraciət edir, silahlı mübarizəsini davam etdirmək üçün məsləhətləşmələr aparır. Səfirin müavini vitse konsul Nuriyev məsləhət görür ki, iş-işdən keçib, daha silahlı mübarizə vaxtı deyil, bu məsələnin üzərindən keçməyə çalışsın.Bu xatirəni mənə konsulxanada Molla Mustafa Barzani ilə görüşən bir yoldaş söyləmişdi. Molla Mustafa Barzani çox çətinliklərlə rastlaşmışdı. İran Kürdüstanından İraq Kürdüstanına, İraq Kürdüstanından Türkiyə Kürdüstanına, oradan da yenə İran Kürdüstanınına keçmiş və Araz çayını keçib Naxçıvana gəlir. Orada onu çox gözəl və səmimi qarşılayırlar, yer verirlər. Bir neçə gündən sonra peşmərqələri ilə birlikdə Bakıya gətirirlər.Bir müddətdən sonra onları Özbəkistana göndərirlər.

Bakıda olarkən, onun dostu Qulam Danişkian Molla Mustafa Barzani haqqında gözəl xatirələr söyləyirdi.Bir xatirəsində o deyirdi:

Bir gün Mir Cəfər Bağırov hamımızı qonaq çağırmışdı. Molla Mustafa Barzani də həmin qonaqlıqda iştirak edirdi.Masanın üstünə hər cür ləziz xörəklər düzülmüşdü. Hamı yeməyə başladı, Molla Mustafa Barzani əlini yeməyə uzatmadı. Bunu görən Mir Cəfər Bağırov soruşdu ki, bu gözəl xörəklərdən nə üçün yemirsən?

Molla Mustafa Barzani cavab verir ki, peşmərqələrim azuqə sarıdan çətinlik çəkirlər, onların rahatlığı olmadan mən yemək yeyə bilmərəm,yemək boğazımdan keçməz.

Qulam Yəhya deyirdi ki, həmin günü bütün azuqələrdən hazırlayıb peşmərqələrə apardılar. Molla Mustafa Barzaninin o hərəkətinə görə bütün peşmərqələri geyim-keçimlə də təmin etdilər. Molla Mustafa Barzaninin mərdliyi, kişiliyi, qəhrəmanlığı gözümün qabağındadır. Öz gördüklərimdən başqa Qulam Yəhya da onun haqqında çox əhəmiyyətli xatirələr söyləyirdi.

**-Əmrəl müəllim, Qulam Yəhya kim idi?**

-Qulam Yəhya Zəncan cəbhəsinin danişkanı idi. 1945-ci ildə Azərbaycan Demokratik Firqəsi MK-nın üzvü idi. Hərbi nazirin müavini sayılırdı. Zəncan cəbhəsinin komandanı, fərmandanı idi. İran qoşunlarında Zülfüqari bandasının dəstələri ilə vuruşurdu, bir addım da geri çəkilmirdi. O da Molla Mustafa Barzani kimi qorxmaz, qəhrəman, sözünün üstündə duran adam idi. İrandan gələn mühacirləri yerləşdirmək ona həvalə edilmişdi. Azərbaycanın 30 rayonunda mühacirlər yerləşdirilmişdir. Bu iş bilavasitə bir il çəkdi. 1959-cu ildə Azərbaycan Demokratik Firqəsinin sədri seçildi, 1985-ci ilə qədər o vəzifədə qaldı, sonra dünyasını dəyişdi. Mən Gəncədə olduğum üçün Molla Mustafa Barzanini Bakıda görə bilmədim.Onu ancaq 1955-ci ildə Moskvada Partiya Məktəbində gördüm. Məni və Muxtar Dudəkani adında bir firqə kadrosunu firqə göndərmişdi, orada oxuyurduq. Məktəbimiz Minsk meydanına yaxın yerdə yerləşirdi. Biz məktəbin ikinci mərtəbəsində dərs keçirdik. Tənəffüsə çıxanda gördüm ki, Molla Mustafa Barzani dəhlizin o biri başında durub. Onun qəhrəmanlığı haqqında o qədər danışmışdılar ki, görən kimi tanıdım.Əlində uzun bir qəlyan var idi, onu tüstülədirdi. Molla Mustafa Barzani tək oxuyurdu, onunla fərdi qaydada məşğul olurdular. Müəllim və dilmancı onunla tək bir otaqda bütün fənnlər üzrə dərs keçirdilər. Bir tələbə olaraq onu hər tərəfli bir diplomat kimi hazırlayırdılar. Üç il biz partiya məktəbində oxuduq.

**- Əmrəl müəllim, bu üç ildə dəyərli bir xatirə yadınızda qalıbmı?**

-Birinci əsas xatirəm odur ki, Molla Mustafa Barzani hər gün dərsdən sonra saat 4-5-də Moskvanın Qorki küçəsi ilə paralel bir küçə vardı, o küçə ilə 4-5-saat piyada gəzərdi və bir böyük dürbin də həmişə çiynində olardı. Bir dəfə biz ondan soruşduq ki, bir belə piyada gəzirsən, bəs durbin nəyinə lazımdır? O, dedi ki, durbin mənim cəbhə yoldaşımdır, ona görə də onu hər zaman özümlə gəzdirirəm. Piyada gəzməyimin səbəbi də odur ki, mən mütləq Kürdüstan dağlarına gedib inqilabi mübarizəmi davam etdirəcəyəm. Bu durbin də o mübarizədə əvvəlcə olduğu kimi indi də yaxın köməkçim olacaqdır. Gəzməyim isə ona görədir ki, burada ayaqlarım tutulmasın, dağlarda düşmənə qarşı döyüşən zaman titrəməsin, qüvvədən düşməsin, möhkəm olsun. İkinci xatirəm odur ki, Miyski küçəsində ona 6 otaqlı bir ev vermişdilər. Demək olar ki, o ev Molla Mustafa Barzaninin müsafirxanası idi. Daşkənddən və başqa yerlərdən gələn peşmərqələr həmin o evdə yeyib-içər, deyib-güler, yatardılar. Qruplar bir-birini əvəz edərdi. Molla Mustafa Barzani daimi onlarla birlikdə olardı. O, həyatını onlarsız təsəvvür etməzdi. Mən özüm də bir neçə dəfə o evə getmiş, onlarla birlikdə olmuşdum. Çox gözəl, hər şeylə təmin olunmuş bir ev idi. Çarpayı qoyulmamışdı, çünki darısqal olardı. Ona görə də təxtixan yox idi. Yerə xalı-xlça döşənmişdi. Hamı uzanıb onun üstündə yatardı. Peşmərqələrdən 10-15 nəfər partiya məktəbində oxuyurdular. Onların hamısı cavan oğlanlar idilər. Onlardan çoxu həmin məktəbdə dərs deyən cavan qızlarla evləndilər. Əbdülkərim Qasımının dövlət çevrilişindən sonra Bəsrədən böyük bir gəmi göndərdilər, İraqdan mühacir düşmüş peşmərqələri geri dəvət etdilər. Onlar


**Molla Mustafa Barzani**

gedən zaman evləndikləri qadınları da özləriylə bərabər apardılar.

**-Hansı yol ilə getdilər?**

-Onlar Qara dənizdən çıxdılar Aralıq dənizinə,oradan Oman dənizi ilə Bəsrə körfəzinə getdilər.

**- O zaman İraq rəhbəri kim idi?**

-Əbdülkərim Qasımi idi.O 1958-ci ildə Molla Mustafa Barzanini birbaşa İraqa dəvət etdi. Sovet hökuməti Molla Mustafa Barzaniyə xüsusi təyyarə verdi. O, Moskvadan Praqaya, oradan da birbaşa Dəməşqə, Dəməşqdən isə Bağdada gedir. Onu Əbdülkərim Qasımi özü çox dəbdəbə ilə qarşılayır, ona bir qəsr verir. Molla Mustafa Barzani ailəsi ilə o qəsrdə yaşamağa başlayır. O, 1963-cü ilə qədər Ə.Qasımının müşaviri olur. 1963-cü ildə Ə.Qasımiyə qarşı general Arif qardaşları üsyan qaldırırlar və hakimiyyəti ələ alırlar. Onlar kürd xalqına qarşı da çıxırlar.Ona görə də Molla Mustafa Barzani ətrafı ilə birlikdə dağlara çəkilir, Kürdüstanda öz iqamətgahını bərqərar edir. Bu mənim eşitdiyim və bildiyim dəqiq məlumatlardır. Moskvada oxuyan peşmərqələrdən birinin adı dəqiq yadımdadır, adı Əli idi. O, şəkil çəkən idi. Bütün ləvazimatı var idi. Mən də bir fotoaparat aldım. Əli bu işdə mənə yardımçı oldu. O vaxtan mən də həvəskar oldum. Onların indi harada olmasından, yaşayıb-yaşamamasından xəbərim yoxdur. Əgər sağ-salamatdırlarsa buradan onlara salam söyləyirəm.

Molla Mustafa Barzani doğrudan da Kürdüstana getdi və dünyasını dəyişən günə qədər mübarizəsini davam etdirdi və mən çox şadam ki, oğlu Məsud Barzani cənabları onun mübarizəsini davam etdirdi və ölməz Molla Mustafa Barzaninin arzularını həyata keçirdi.Bu müqəddəs işdə onlara, kürd xalqına böyük müvəffəqiyyətlər arzulayıram.

Sağlıq olsun, qismət olsa o böyük şəxsiyyətin qəbrini ziyarət etməyə və Məsud Barzani cənablarını görmək, xatirələrimi onunla bölüşmək istəyirəm.Mən, bütün Kürdüstan xalqına səmimi salamlarımı göndərirəm.

**-Müsahibə üçün təşəkkür edirəm.**

**-Sağ olun.**

**Müsahibəni apardılar: Tahir SÜLEYMAN**
**Əgit ÇƏRKƏZ**



## Rîya Şehîda

Xastina milet ew Kurdistane,
Her bawarya min gelê kurdane,
Em ketne cengê cihan dizane,
Bona serbestyê hatye zemane,
Ruh me teyirî li destî zulmê,
Îraqê, Sûryê, Îranê, Romê.
Welat bu Leylê, em bûne Mecnûn,
Ji boy azayê pir kişyaye xwîn,
Em çiqas cara ketin û rabûn,
Me bi dil bijart ew riya mezlûm,
Em perçe kirin, nizanin şermê,
Îraqê,Sûryê,Îranê, Romê.
Zencî aza bûn nemane kole,
Roja me reşe, dilê me kule,
Me duxun herdem, ça qurê çille,
Mil me ranave qey bêjî şile.
Yektya milet jî tune vê demê
Îraqê, Sûryê, Îranê, Romê.
Rîya azayê pirsa sereye,
Hemû bawarî gelê min teye,
Welat parêzê kurda der maye,
Wan hêsrê xwînê, tek dijmin şaye
Dikewe birîn, gel neke xemê
Îraqê, Sûryê, Îranê, Romê.
Biratya hember ka fireqetî?
Azaya welêt xast bi her şertî,
Welat Kurdistan, axa cinetî,
Dêrsim bilinke, nav her miletî,
Emê hilşînin dîwanê zulmê,
Îraqê, Sûryê, Îranê, Romê.

## Tu hevalî

*Pêşkêşî şervan*
*Newzad dikim*

Şervan xwîn rêt li Kurdistan,
Boy azayê, ruh kir qurban,
Yê sax meşyan şehîd lê man.
Şîrînê me şîr helalî,
Boy çi wan got, ne hevalî?
Şer kir weke Rostemê Zal,
Rûvî rabûn nadin mecal,
Şerwanê me tu delalî,
Boy çi wan got, ne hevalî?
Şev, ro, şer kir, boy Kûrdistan,
Rojêd sermê bi berf baran,
Îro rabûn çendê nezan,
Gotin xayîn, tu dinalî,
Boy çi wan got, ne hevalî?
Xûnê avda ew darezar,
Çîya banî potê wi xar,
Xar neyara derbê xedar,
Delalê me wek misqalî,
Boy çi wan got, ne hevalî?
Wî şerwanî, ey hevalo,
Bê xayî hişt, mal û halo,
Dayka xwe pîr, bav jî kalo,
Pizmamê min, tu kemalî,
Boy çi wan got, ne hevalî?
Şervan îro ne kubare,
Dara bi rez dide behre,
Hub-hizkirin, ew ne are,
Bejna bilind, ru bi xalî,
Boy çi wan got, ne hevalî?
Dêrsim qîrya got hevale,
Ew şkeste, pir bedhale,
Namûs, qîret her tim bale,
Bijî şervan hezar salî
Boy çi wan got, ne hevalî?

18.10.2002.

# Bila tu kes hemberî gel nebe asêgeh

**Mêvanê me Metlebê Çolîye, ew sala 1962-a Komara Nexçivanê, gundê Sûsê hatîye dinyayê, Zaningeha Êkonomîyê xitim kirîye , zewicîye, sê lawên wî hene. Niha serokê Avtonomîya Kurdên Moskvayêye.**



Tahir Silêman

- Kek Metleb, cara ewlîn hûn bi xêr hatine nivîsxana rojnama"Dîplomat"-ê .

- Spas dikim û zef şame, wekî hûn li Azerbaycanê rojnameke kurdî, rûsî û azerbaycanî ser navê "Dîplomat"-ê diweşînin û himjî we nivîsxana wê amade kirîye. Boy vê yekê ez wera pir eferim dibêjim û vê xebata pîrozda jî wera serkeftinê dixwazim.

-Kek Metleb, hîvî dikim derbarê jîyana xweda hinek agahî bidine xwendevanên rojnama me.

- Ez sala 1962-a li komara Nexçivanê, gundê Sûsêda ji dayik bûme.Ew gunda gundekî nase, nivîskar û helbestvanê kurdayî eyan Elîyê Evdilrehman derbarê wî gundîda romana xweye "Gundê Mêrxasan" nivîsîye.

- Hûn bi kîjan armancê çûne Moskvayê û çi karê dikin?

- Binelîyê gundê me hemû kurdbûn, piştî kutakirina dibistana navîn, ez çûme eskerîyê. Dû wêra hatime Moskvayê. Di ûnîvêrsîtêta Êkonomîyêda hatime pejirandin û min ewa xitim kir.

1991-ê salê virda min dest pêkir, bi pirsgirêkên kurdanva mijûl bûm.

- Kek Metleb, parîkî derheqa kurdên Nexçivanêda biaxifin, çend gundên wana hene, rewşa wana çawane?

- Bi gorîya min li Nexçivanê vê gavê anegorî bist û bênc-sî hezar kurd dijîn, wedê dewleta Sovêtê gellek kurdên me assîmle bibûn, nasnama wanda pirsa "kurd" nehatibû nîşandayîn.

Lê yên xwe "kurd" dabû nivîsarê jî pirbûn, kurd nêzîkî bîst-sî gundanda, usa jî bajarê Nexçivanê xweda jî jîyanê dikin.

Piştî hilweşîyana Sovêtê rewşa kurdan pir xerab bû. Ji wana gellekan barkirin, berê xwe dane dewleta Rûsîyê, Asîya Navîn û hetanî Sîbîrê çûn. Naha Nexçivanêda kurd kêm mane, ew jî bi heywan xwayîkirinêva mijûlin.

-Hûn çendê salê li Moskvayêda cîwar bûn û ser pirsgirêka gelê kurdva kîngêva dest bi xebatê kir?

- 1982-da ez çûme Moskvayê. 1988-ê salê li Moskvê bi serkarîya Mehmedê Silo me assosasîya kurdan damezirand, navê wê jî danî "Yekbûn". Wê sazîyêda 21 mirovî kar dikir. Hetanî 1991-ê salê karê me dom kir, ji dervayî welêt heval jî hatin, tevî me bûn. Kek Tahir, ne tê bîra min, hûn jî wan civînada beşdar dibûn.Hûn jî wan bûyara zanîn.

-"Yekbûn"-ê hetanî kîngê berdewam kir û çima hate teribandin?

- Wê gavê ji serokatîya dewleta Sovêtê mera gilî dabûn, wekî yê kurdanra Avtonomîyê bidin, hela serbarê serda komîssîya jî hatibû çêkirin, serkarê komîssîyê Sokolov bû. Ji me kurdan jî wê komîssîyêda ci digirt. Lê yekîtîya kurdan xwe hevdu negirt, kesî gurra kesî nekir, her yekî digot "ez". Ji ber wê jî, ew sazîya belabû. Piştî wan bûyeran me çend konfrans jî derbaz kir, hezaranva kurd hatine meşan, dîsa boy tunebûna tifaqîya me tu tiştekî berbiçav nehate stendinê.

1994-ê salêda Yekîtîya civaka kurdên Hemûdunyayê hate damezirandinê. Xênî



Metlebê Çolî

vê yekê "Civaka kurdan" yê komarên Yekîtîya Sovêta berê hate çêkirin.

- Çend endamên wan sazîya hebûn û armanca wana çi bû?

- Yekîtîyêda danzde mirov cî digirtin. Bi rastî em ewqasî karekî berbiçav jî nakin, lê çi pirsgireka gel hebe em alîkarîyê didinê.

-Li Rûsîyayê çend "Avtonomîya" kurdan heye û helaqetîyê we çawane?

- Ez berpirsîyarê "Avtonomîya" kurdên Moskvayême. Xênî wê li Tambovê, Saratovê, Nîjnî-Novgorodê, Krasnodarê, li rêspûblîka Adigêyê jî "Avtonomîyê" kurdan hene.

-Çi helaqetîyê we û yên Rêspûblîkên Sovêta berê heye?

- Ya rast, ez şaş mam, wekî we rewşeke awa ava kirîyê, ew rewşa we saz kirî, bi rastî qet bal me-li Moskvê jî tune.

Lê gellekî xemgînîyê dikşînim û ber xwe dikevim, ku Navenda Çanda Kurdê li Bakûyê, kîjan, ku ji alîyê dewletê hatîye damezirandinê tu karê nake, çend caran ez bi xwe çûme wura, min derî dadayî dîtîye.

Lê îro roja rehetîyêye(bazar), nenihêre vê yekê, hûn dixebitin. Ez dibînim mamocta Egît, Nerîman, Xweşnav, Ramîz, Vîdadî, Refayil, Akîf, Nîgar xanim, xwendevan Îsmayilê Tahir, Rasîmê Têmir rojnamê amade dikin. Ji boy xebata we, ji wera zor spas divêjim. Ev xebata we hêjayî xelatên bilindin.Pêwîst bû, eva xebata Navenda Çanda Kurd bikira

- Hûn derbarê wê çandêda dikarîn çi bêjin?

- Ez zanim, wekî serkarê çandê Kamile. Berê dîsa pir-hindikî helaqetîyên me hebû. Rojnama "Dengê Kurd" du meha, sê meha carekê derdiket. Lê naha ewa jî tune. Vê carê hatinê dîsa min dît, ku wê çandêda tu kar nayê meşandin, navê wê jî ji ser dêrî hildane, timê dadayîye. Hurmeta min mamoste Kamilra heye, lê tu kesek boy pêşta çûyîna çanda gelra tengasîyê gerek çêneke. Nikare karê bike, bila here mala xweda rûnê, gel ji nava xwe xebatkarekî jêhatî, serxwe bibijêre.

Yek jî ez nizanim mirovên bi zimane kurdî nizane çawa dibe serokê Navenda Çanda Kurd da? Mirovên mala xweda bi zimanê dê nikaribe biaxife, wê çi bide millet..? Mamoste Kamil ser vê mijarê kûr nebe jî, sivik bifikire wê baştirbe. Ev pirsê min digîhîje wan mirovan, kîjan kû ji kurdayetîyê têretêr diaxife, lê mala xweda zarokên xweva nikare bi kurdî biaxife. Mirovên zarokên xweva nikaribe bi kurdî biaxife, kurdîtîyê hîn bike, gelo wê nava gel çawa ji kurdayetîyê biaxife û kurdîtîyê hînî netewîke?

- Hûn zanin li Kurdistana başûr dewleta Kurdan dameziriye, kek Mesûd Barzanî bûye serokê wê, mam Celal Talebanî bûye prêzîdêntê dewleta Îraqê. Ez bi xwe çend caran çûme Welêt. Hûn, kurdên Rûsîyê evê serkeftinê çawa dinirxînin?

- Eva bona gelê kurdên cîhanê serkeftineke pir girînge, em gellekî şane, dîrokê eva mecala daye gelê kurd. Pêwîste hemû kurd bi karûbarê xweva piştgirîyê bidine herdu serokan, boy wê yekê, wekî zûtirekê Kurdistaneke serbixwe bê avakirin.

Bona helbijartina mam Celal Talebanî û Serok Mesud Barzanî me qurban serjêkir, şayî derbaz kir û nama pîrozbahîyê şand, ji Xwedê wanara emirê dirêj, can saxî xwestin.

Ez gellekî şame, wekî we îsal cejna"Newroz"-ê derbaz kirîye. Min vîdîoyêda mêze kir, dît wekî nêzîkî 200-300 kurd beşdarî eyda "NEWROZ"-ê bune. Berê, Navenda Çanda Kurd salê sêçar caran eyd, konsêr, civat derbas dikir. Koma folklorê, koma dîlanê, qursên zimanê kurdî hebûn, lê çi bi wan hat?

Ya rast, hun kareke berbiçav dimeşînin. Ji cîyê tune we ev mecal saz kirîye. Min têlêvîzîona "Kurdistan TV"-da dît, wekî we, mamosta Egîtva li Kurdistanê pirtûka V.F.Mînoskîy "Kurd û Kurdistan" û kitêba mamosta Egîtê Çerkez "Çima" cara duyemîn paytexta Kurdistanê, Hewlêrêda da weşandinê. Dîsa kitêba M.Î.Şemsî "Şeref xan Bîdlîsî "ŞEREFNAME" çav kanîya dîroka gelên kurd". Ûsa jî V.F.Mînorskîy we wergerandîye ser zimanê azerî. Evan kirinên we xebatên pir mezinin,

Lê ev karana yê Navenda Çanda Kurde wekî ewana bikin. Ya rast, şabuneke mezine, wekî îro we evan karana kirine û hun mehê dû cara rojnamê diweşînin. Eva ne kû seva min,ûsa jî bona hemû gelê me kurdan karekî gellekî mezin û girînge. Ez hîvîdarim, wekî hûnê wedekî kurtda rojnamê bikine hefteyane. Em dibînin, dibihîzin ku, dengê rojnama "DÎPLOMAT"-ê ji Qazaxistanê, Krosnodarê, Qirqizistanê, Gurcistanê, Nexçivanê, Saratovê, Îraqê, Turkîyayê dengêwî tê. Ez dîsa diwekilînim, eva kareke pîroze. Vê rêya pîrozda wera serkeftinê dixwazim û spas bibêjim.

-Spas boy hevpeyvîne.

*Hevpeyvîn bir: Tahir Silêman*

# Serdana yekê ya berpirsekê hikumeta nu ya Îraqê bo Kurdistanê



(Despêk rûpela.1)

-Ebdilezîz Teyyib wezîrê Çandinê yê Kurdistanê pêşwazîya şandeka bilinda spanî kir kû tê de Dr. Marîa pispora daristanan û Paplo Monius û rojnamevan Maniel Martorel cî digirt.

Di hevdîtinê de nirxandina rewşa daristanan û guhertinên li darastan çê bune û mifadîtina ji pisporîya bîyanî ji bo pêşvebirina çandinê li Kurdistanê û girîngîdayina bi vê warî û şandina endazîyar û têknînkar û pisporên zaningehê yên warê çandinê ji bo Spanya û vekirina korsan hate giftûgokirin.

Di hevditînê de herweha Ebdilezîz Teyyîb wezîrê Çandinê bal kişandina ser sîyaseta namirovaneya rijêma Baş ku sîyaseta şewitandina daristanan li Kurdistanê pêk dianî, herweha ji amadeyîya wezaretê ji bo pêkanîna karê şandê û hesankarîyên pê re dîyar kir.



# Serok Barzanî pêswazîya Dr.Berhem Salih kir

-Êvara îro rêzdar Mesud Barzanî serokê Kurdistanê li Selaheddînê pêşwazîya Dr.Berhem Salih cîgirê serokwezîrê Îraqê kir.

Di hevdîtinê de dîtin û nêrîn li dor pirsên girêdayî prosêsa sîyasîya Îraqê û hewlên ji bo dagirtina valahîay herdu wezaretên Karê Hundir û Parastinê yên kabînêta nu ya hikumeta Îraqê giftûgo kirin.

# Kurdên binxetê li Bêlçîkayê civîyan

-Kurdên Kurdistana binxetê îro li Bêlçîkayê dest bi civîna konferansa xwe kirin û di vê konfransê de minaqeşeyên germ li ser avakirina organeka sîyasî ya wekî "Meclîs El-Wetenî" hat kirin. Îro sibehê seet 10-ê konfransê destpê kir û piştî hilbijartina endamên dîwana konfransê minaqeşeya herî zêde li ser navê wê organa ko dê bête ava kirin çêbû.

Partîyên sîyasî yên wekî Partîya Yekitîyê û Partîya Azadîyê û hinek kesên serbixwe dibêjin bila navê "meclîsê" li vê organê nîyet kirin heta ko partîyên di yên Kurdistana binxetê tevli vê prosêsê dibin. Organîzatorê konfransê Şerko Ebas û hinek kesên di dibêjin nexêr bila di navê organê de bêjeya "meclîsê" hebe û divet kurd di sîyaseta xwe de hinekê radîkaltir û agrêsîvtir bin.

Partîya Yekitîyê ya Îsmaîl Omer û partîya Hemîdê Hecî Derwêş û Partîya Dêmokrat ya Mihemed Nezîr Mistefa beşdarî konfransê nebûne lê belê mirovên dostên wan û nêzîkî wan hatine konferansê û gotgotek heye ko ew partî ji ber ko li Kurdistana binxetê aşkera sîyasetê dikin nikarin aşkera beşdarî vê konfransê bibin lê belê ne li dij in û di bin re pozîtîv li vê xebatê dinêrin.

Sîyasetmedarê Kurdistana binxetê Selêh Bedreddîn ko niha li başûrê Kurdistanê dijît duh bi aşkerayî nivîsarek nivîsî û got ew beşdarî vê kon-




fransê nabe û wî organîzatorê konferansa Waşhîngtonê û vê konfransê Şerko Ebas bi "kontraktorçitîyê" tawanbar kir.

Ji bilî Partîya Azadîyê, Partîya Yekitîyê, Partîya Peşvero, Partîya Yekitîya Demokrat û ji famîlyeyên naskirî yên Kurdistana binxetê, nunerên ji Mala Ebas, Mala Heqî, Mala Haco û Mala Xiznewî û gelek kesên di yên serbixwe beşdarî konfransê dibin. Li ser hev zêdetirî 100 kesan hatine konfransê û civînên navxweyî îro û sibê çêdibin û roja duşemê jî li Parlamentoya Ewropayê civîneka sêseetî û preskonferansek dê çêbe û encamên konfransê de bêne ragîhandin.

# Heveserokên DTP'ê çûn Herêma Federal a Kurdistanê

Heveserokên DTP'-ê Ahmet Turk û Aysel Tûglûk, ji bo kû tevli civînê de Grûba Xebatê ya Kurd a Enternasyonal a Sosyalîst di 29'-ê gûlanê de li bajarê Silêmanîyê yê Herema Federal a Kurdistanê li dar bixe bibin, îro çûn Hewlêrê.

Heveserok kû bi Cîgirê Heveserokan Nazmi Gur û Berpirsyarê Ewropayê yê DTP'-ê Faîk Yagizay re di saetên nîvro de bi rîya hewayî çûn Hewlêrê, li otêla ji bo wan hatîye veqetandin, bi cîh bûn. Der barê Heveserokên DTP'-ê kû dê berîya civîna li Silêmanîyê çend hevdîtinan pêk bînin dê, hin tû daxûyanî nehatine dayîn.

Hate ragihandin kû de heveserok di seri de bi rayedarên hikumetê, bi nunerên sazî dezgehan re ji hevdîtinan pêk bînin.

# Rizgar Elî: Hijmara wan erebên kû di dema rêjîma Bass de, hatibûn Kerkûkê (279) hezar malbete



Serokê Civata parezgeha Kerkûkê ji Wezîrê Karûbarê Navçeyên Derveyî Herema Kurdistanê di Hikumeta Herema Kurdistan de xwest, komîteyekî taybet werê damezrandin ji bo bi cîh ênana maddeya (140) ji Destûra Herdemîya Îraqê. Di civînekî de kû roja Duşemê, 22-ê gulanê di navbera Wezîrê Karubarê Navçeyên Derveyî Herema Kurdistanê di Hikumeta Herema Kurdistanê de, Dr. Mihemed Îhsan û Seroke Civata Parezgeha Kerkûkê Rizgar Elî de hat girêdan, pêwîstîya asayikirin rewşa Kerkûkê û navçeyên din hat gotubêjkirin.

Di civînê de Serokê Civata Parêzgeha Kerkûkê pêşnîyazkir komîteyek werê pêkhenan ji bo bi cîh ênana maddeya (140) ji Destûra Herdemîya Îraqê. Elî di nav axavtina xwe de xwest, ku budceyekî taybet û desthilatîyekî bi temamî ji bo wê komîtê were dayîn, da ku karên xwe encam bide, li gel hebûna komîteyekî çavder, berpirsîyar be, di cavderî kirina karên vê komîtê de.

Elî ji hêlekî din vê xwest, ku rola Turkmenan wekî netewekî zilim lêkirî navê piştgûhxistin. Di berdewamîya civînê de, Serokê Civata Parêzgeha Kerkûkê serjimêrek derbarê hijmara erebên xwênecîh yên kû di dema rêjîma Bass de, hatibûn Kerkûkê pêşkeşkir.

Serokê Civata parêzgeha Kerkûkê got: Hijmara wan erebên kû di dema rêjîma Ba'ss de, hatibûn Kerkûkê (279) hezar malbete û ew kesên kû formên xwe yên xwarinê ji Piroseya Azadîya Îraqê şûn ve guhastina ji bo wan navçeyên kû jê hatinê bi hijmar (45) hezar kesin. Ji 45 hezarî (10) hezar kesî îmzekirinê û amadene vegerin şûnên xwe eger em alîkarîya wan bikin.

Ji hêla xwe vê Wezîrê Karubarê Navçeyên Derveyî Herema Kurdistanê xwest kû alîkarîyêkî temamî hebe di navbera Hikumeta Herema Kurdistanê û birêvebirîya Parêzgeha Kerkûkê de, ji bo bi cîh ênana maddeya (140)-ê.

Herweha bernameya karê Serokwezîr Nurî El-Malîkî jî bi bernameyekî bikêr nirxand û hêvî xwest ew bername di kirdarî de werê pêkhênan. Derbarê pêşnîyaza Serokê Civata Parêzgeha Kerkûkê de jî, piştgirîya xwe ragehand ji bo pêkhenana wê komîteyê.

# Hewlêr.. Konfranseke li ser romana kurdî

-Bi çavderîya brêz Nêçîrvan Barzanî serokwezîrê Kurdistana federel, îro saet di 10:00-ê sibê de bi wextê Hewlêrê, konfransa li ser romana kurdî bi duruşmê "Geşbûna romana kurdî nîşana şaristanîya civaka me ye" dest pê kir.

Konfransa ku ê sê rojan bikêşe ji bal Felekeddîn Kakeyî wezîrê çandê ê hikumeta Kurdistanê hat vekirin. Kakeyî bi navê serokê hikumetê Nêçîrvan Barzanî û bi navê wezareta kûltûrê axaftinek kir, dîyarkir kû wezareta wî girîngîyeka taybetî dide geşbûn û belavbûna romanê di edebîyyata kurdî de, ew hewl didin kû komîsyonek bê amadekirin ji bo zîncereyek ji romanên cîhanê ên klassîk û modêrn û ji romanên kurdî bên weşandin. Kakeyî li ser yekem romana kurdî "Şivanê Kurd" a ji bal Erebê Şemo ve hatîye nivîsîn rawestîya. Wî got li gel wê her wiha ê romanên Ezîzê Mela Res, Mehemed Mukrî, Ebdullah Sîraç û hin nivîskarên din bên capkirin. Ne tenê ê romanên Kurdistana başûr, herwiha yên beşên bakûr, rojhilat û rojava û yên kû li derveyî welat hatine derxistin jî ji nuh ve bên derxistin.

Piştre parezgarê Hewlerê Newzad Hadî, profêsor Îzzeddîn Mistefa Resûl serokê desteya bilind a Yekitîya Nivîskarên Kurd û Saadullah Peroş serokê liqê Hewlêrê ê Yekitîya Nivîskarên Kurd gotarên xwe bi



bûna konfransa li ser romana kurdî xwend.

Di pey wan re Dr. Muhsîn Ehmed babetek bi navê "Sivanê Kurd wek yekemîn romana kurdî" pêşkêş kir.

Saadullah Peroş ragîhand Peyamnêrê û radyoya Zagrosê û got: "Me xwest kû romana kurdî taybetmendîyeke werbigire, ji ber wê yekê kû romannivîsî di edebîyata kurdî de wek janrekî, karekî nuh e, heta niha karekî taybetî ji bo romana kurdî nehatîye kirin. Gelek pirs li ser romana kurdî hene, wek gelo romana kurdî serî hildaye yan na, gelo romana kurdî di çi qonaxê re derbas dibe. Ji bo van pirsan ji me hin kesên di van waran de pispor û naskirî anîne konfransê kû yan romannivîs in yan jî rexnegir in"

Herdu rojên din e konfransê ê li hola Yekitîya nivîskaran a bi navê Hola şehîd Hadî Xoşnaw bê berdewamkirin.



Vidadi Qurbanov

## AGLA, TELLI SAZIM, AGLA

Geri dönməz bu karvanın,yolu hardan haradı?
Karvanbaşı başın əyib;- Nigarandı, nalandı.
Vətənimiz əsir düşdü, sərvətimiz talandı,
Harda qaldın, ağlamırsan, telli sazım, ağla sən.

Ağbirçəkli anaların sinəsində yara var,
Gülçöhrəli körpələrin taleyində qara var.
Yetim qalmış bu millətim hara getsin... hara var?
Harda qaldın, ağlamırsan, telli sazım, ağla sən.

Ruhlarımız girov qaldı, töhmətini götürdük,
Puça döndü həyatımız, mənasını itirdik.
Qaçqın-köçgün damğasıyla ömrümüzü bitirdik,
Harda qaldın, ağlamırsan, telli sazım, ağla sən.

Köhlən atlar yəhərlənib, boş yəhərdə gəm yeyir,
El-obamız diyar-diyar, pərən düşüb, qəm yeyir.
Naxələflər yurdu satdı, kefin çəkir, dəm yeyir,
Harda qaldın, ağlamırsan, telli sazım, ağla sən.

Nə ölməyə üzümüz yox, yaşamağa haqqımız,
Viran olub yurd yerimiz, talan olub taxtımız.
Gülə bilmir üzümüzə qara gəlmiş baxtımız,
Harda qaldın, ağlamırsan, telli sazım, ağla sən.

Qorqud ruhu yurd yerində qopyz calıb aglayır,
Ələskərin nur qəbrini ah-nalələr dağlayır.
Qaçaq Nəbi məzarından Boz atını haylayır,
Harda qaldın, ağlamırsan, telli sazım, ağla sən.

**Bakı - 2006**

Rəfayıl Cəlil oğlu Mayılov 1971-ci ildə Laçın rayonunun Şeylanlı kəndində kürd ailəsində dünyaya göz açmışdı. Ailəlidir, bir övladı var, ali təhsilə malikdir. Gözəl şeirlər yazır, bir kitabın müəllifidir.

Qarabağ döyüşlərində həmişə ön cərgələrdə olan Rəfayıl, tağım komandiri vəzifəsinə qədər yüksəlmişdi.Onun bir arzusu var, oda tapdaq altında olan vətən torpaqlarını mənfur düşmənlərin tapdağından azad etmək və doğma yurd yuvasına qayıtmaqdır.

Rəfayılın şeirlərində vətən həsrəti, vətənə məhəbbət, yurd yanğısı, özünü daha qabarıq göstərir. O, həm də kürd dilində şeirlər yazır. Şairin bir neçə şeirini oxuculara təqdim edirik və ona uğurlar diləyərək deyirik ki, gün o gün olsun, vətəndə qalibiyyət şeirləri yazasan.



## RABE, RABE!

Laçîn maye li bin destan,
Birînên dil wek goncale.
Pir girane va qul, va jan,
Bûye revoke, gel bê hale.

Rabe, rabe Azerbaycan!
Hilgir waran, ji dest maran.
Li ber neyar, bibe beran,
Bavpîre me Ristem Zale.

Rafayil bê Laçîn maye,
Va belaye, ax û vaye.
Va çi bager, va çi baye,
Gel bê ware, gel bê male.

## LAÇÎNÊ MIN TU LI KUYE?

Warê eylo, dîyarê baz,
Laçînê min tu li kuye?
Kane govend,kane "Qaz-qaz",
Laçînê min tu li kuye?

Li dîrok me dît pir-pir gesp,
Te firotin, dijmin kir qesp.
Dillerzîne li ser te hesp,
Laçînê min tu li kuye?

Li te gundan çima revî?
Tu şemal bû, niha şevi.
Mertalê kurd bi çar devî,
Laçînê min tu li kuye?

Bila yekbe Azerbaycan,
Yekdî dibe bi dijmin jan.
Refayil jî bi te qûrban,
Laçînê min tu li kuye?

## LAÇIN

Elə qovrulmuşam çıxıb cızdığım,
Həsrətinə dözmək olmur, ay Laçın.
Göynəyir sinəmdə hər bir an dağım,
Min-min zəhmətimiz olub zay, Laçın.

Xəyanətə qurban etdilər səni,
Düşmənə verdilər cənnət vətəni.
Qəlbimdə el dərdi, yurdun şivəni,
Olub qəm dəryası, olub vay, Laçın.

Sənsiz didələrim qan ağlayır, qan,
İnan, xilasına hazıram hər an.
Yaralı ürəyim ayrılığından,
Olub qəmlə dolu bir saray, Laçın.

Vətəndə-vətənsiz olmaq bəladı,
Başlara töhmətdir qaçqınlıq adı.
Böyük tanrı olsun xalqın imdadı,
Dərd qəlbimdə olub laybalay, Laçın.

Bircə çiçəyini üzüb-dərməyə,
Şeylanlı kəndimə salam verməyə,
Bir dəfə üzünü gəlib görməyə,
Olaydım bir uçan torağay, Laçın.

Rəfayılam, sənsiz qalmışam yetim,
Torpağına gəlib mən necə yetim?
Gecə də, gündüz də, budur niyyətim,
Şirin canım olsun sənə pay, Laçın.

# LAÇIN DƏRDİ, LAÇIN HƏSRƏTİ...

Təbiətin ən füsünkar gözəlliyini özündə cəmləşdirib, xüsusi bir ecazkar cazibəyə malik olan, kiçik Qafqaz dağlarının qartallar oylağı olan İşıqlı dağının ətəklərində, Laçın rayonunun Kamallı adlı bir kürd kəndi yerləşirdi. Ərazisi 1900 ha çatan bu kəndin təsərrüfatı 180-ə, əhalisinin sayı isə 2000 nəfəri ötüb keçmişdi. Əhalinin əsas məşğuliyyəti heyvandarlıq və əkinçilik idi. Kəndin o dövrdə 800-900 baş iribuynuzlu mal-qarası, 6-7 min baş xırda buynuzlu davarı, meyvə və bostan məhsulları yetişdirmək üçün böyük bağ sahəsi var idı. Kolxoz təsərrüfatında isə 400 baş iribuynuzlu mal-qara, o cümlədən 150 baş sağmal inək, 4000 baş xırda buynuzlu davarı var idi. Əhalinin maddi və mənəvi vəziyyəti olduqca yaxşılaşmışdı. Camaatın istifadəsində 2 ədəd su artezian quyusu,müasir tipli böyük mağaza, çörək bişirmə müəssisəsi, rabitə şöbəsi, 170 nəfərlik komutator, mərkəzi kitabxana, həkim məntəqəsi, on illik orta məktəb binası, tele ötürücü stansiya və s.var idi. Kənd gənclərinin təşəbbüsü ilə şəhər tipli mədəniyyət evi inşa edilmişdi.

Kolxozun iqtisadiyyatı çox güclü şəkildə inkişaf edir,əhalinin maddi və mədəni rifahı yüksəlirdi. Təsərrüfatın 2 ədəd kombayını, 3 ədəd tırtıllı traktoru, 3 ədəd təkərli traktoru, 1 ədəd ekskavatoru, 8 ədəd yük avtomobili, yem dəyirmanı və digər kənd təsərrüfatı texnikası var idi.

Sabiq kolxoz sədri Cəfərov Ələddinin təşəbbüsü ilə bu zonada ilk olaraq kənddə elektrik dəyirmanı tikilərək son tamamlama işləri görülürdü. Lakin bədnam və mənfur qonşularımızın (onlara qonşu demək mümkünsə) məkrli və iyrənc siyasəti güllü-çiçəkli, axar-baxarlı ərazilərimizi, münbit torpaqlarımızı zəbt eləmək, mənimsəmək niyyətləri çox-çox qabaqcadan hazırlanmış bir plan idi.

Demək olar ki, erməni faşistlərinə 1988-ci ildən doğma Azərbaycanımızı parçalamaq, torpaqlarını işğal etmək, xalqlarımızın başına olmazın müsibətlərini gətirmək üçün fürsət düşmüşdü.

1992-ci il mayın 8-də alınmaz qala olan Şuşa şəhərimizi zəbt etdikdən sonra, Ermənistan və Rus orduları Dağlıq Qarabağ və Ermənistan tərəfdən Laçın rayonunu mühasirəyə aldılar, Tanklarla, toplarla və vertolyotlarla silahlanmış güclü hərbi birləşmələrə qarşı əliyalın camaat nə edə bilərdi?

O zamankı hakimiyyətin səriştəsizliyi nəticəsində orduda özbaşınalıq, fərarilik baş alıb gedirdi. Laçın beş-on nəfər özünü müdafiə könüllü dəstələrinin ümidinə qalmışdı.

Dövlət tərəfindən heç bir kömək göstərilmədiyinə görə "Laçın dəhlizi" adı ilə məhşur olan Laçın-Şuşa, Laçın-Zabux yolu və bütövlükdə Laçın rayonu 18-i may 1992-ci ildə süquta uğradı.

Rus ordusu ilə birləşən Ermənistan ordusu əliyalın xalqımıza divan tutdu, kəndləri yandırdı, qız-gəlini, qoca-cavanı, uşaq-körpəni əsir tutdu, başlarını kəsdi, xalqımızı soyqırıma məruz qoydu.

Laçın şəhəri və 130-a yaxın yaşayış məntəqəsi, 60 min nəfərə yaxın olan əhalisi amansız bir faciə ilə üz-üzə qaldı. Rayon əhalisi respublikamızın ellidən çox rayon və kəndlərinə səpələndi.

Hal-hazırda, təkcə Kamallı kənd əhalisi, on iki müxtəlif bölgədə məskunlaşmış, məşəqqətli və amansız məcburi köçkün həyatı sürürlər. Düz 14 ildir ki,vətən həsrəti onların qəlbini, ürəklərini parçalayıb üzür. Qocalarımız və orta yaşlı əhalimiz,demək olar ki, yurd həsrətinə dözməyib qürbət diyarlarda vətən həsrətiylə dünyalarını dəyişiblər.

Dövlətimizin məcburi köçgün və qaçqınlara göstərdiyi qayğı hamımız tərəfindən razılıqla qarşılanır. Lakin nə qədər firavan və qayğısız yaşasaq da bizə öz doğulub boya-başa çatdığımız elimiz-obamız gərəkdir.

**Əzizim,vətən yaxşı,**
**Geyməyə kətan yaxşı.**
**Qürbət cənnət olsa da,**
**Ölməyə vətən yaxşı.**

-xalq bayatımız bizim dərdimizi çox dolğun bir tərzdə ifadə edir.

**Bu gün hüzn günüdür!..**
**Bu gün əzm günüdür!..**

Bu gün biz birləşib torpaqlarımızı qanımız bahasına olsa belə almalıyıq!

Alçalmış, təhqir olunmuş, şərəf və ləyaqətimizi geri qaytarmalıyıq! Artıq vaxtdır, birləşib erməni cəlladlarını, torpaqlarımızdan qovub çıxarmalı, el-obamızı öz doğma yurd-yuvalarına qaytarmalıyıq.

**Xalq səbrsizliklə o günü gözləyir!**

**Vidadi Qurbanov**

# ДИПЛОМАТ

ПОСЛЕДНЯЯ страница

№ 09(034) 01-15 Ийуня ОБЩЕСТВЕННО-ПОЛИТИЧЕСКАЯ ГАЗЕТА


## *Масуд Барзани: позитивное развитие ситуации в Ираке благотворно повлияет на Курдистан*



Президент Иракского Курдистана Масуд Барзани заявил, что любые позитивные изменения в Ираке положительно влияют на Иракский Курдистан.

Барзани в заявлении для прессы, опубликованном в понедельник в Эрбиле, говорит, что необходимо время для того, чтобы федеративная структура, которая заявлена, определят тип отношений (Курдистана) с Багдадом, подчеркнув, что эти отношения улучшились по сравнению прошлыми годами.

«В прошлом мы не были партнерами тех, кто правил в Багдаде, а сейчас мы принимаем большое участие в создании нового Ирака», -- пояснил он.

Барзани сделал упор на то, что работа Курдистана по освоению нефтяных богатств ведется по соглашению с Багдадом и в соответствии с конституцией Ирака.

Касаясь своих критических замечаний в адрес федерального правительства по вопросам о Киркуке и доле федерального бюджета для Курдистана, президент Барзани подчеркнул, что они не носят личного характера, а направлены на улучшение отношений между (курдским) регионом и Багдадом.

«Мы требуем, чтобы эти отношения были предельно гласными и чтобы средства в наш бюджет, как и в бюджеты других провинций приходили во время», -- подчеркнул он.

»Наша критика обусловлена тем, что после падения режима Саддама Хусейна мы не видим практических шагов к разрешению проблемы Киркука и других регионов Ирака», -- сказал президент.

По поводу Турции он отметил, что это важный сосед Курдистана, с которым регион готов сотрудничать, и что важно поддерживать с ней хорошие отношения.

Он сказал, что Турция имеет большой опыт в восстановлении и создании инфраструктуры, выразив надежду, что она сыграет свою роль в восстановлении Курдистана.

Он также выразил надежду, что разрешение проблем между Рабочей партией Курдистана и Труцией пойдет по дипломатическому, а не военному пути.

На вопрос о своей позиции по поводу обстрела районов внутри Иракского Курдистана со стороны Турции и Ирана президент Барзани сказал, что он обратился к соседним странам с тербованием уважать иракский суверенитет, заявив, что « в то же время для нас неприемлемо то, что некоторые используют нашу территорию для того, чтобы наносить ущерб другим (странам)».

## *НОВОСТИ ОДНОЙ СТРОКОЙ*

*-Халед Салих назначен пресс-секретарм Регионального правительства Курдистана*

*-Заместитель председателя демократической партии иранского Курдистана объявил о начале вещания спутникового телевизионного канала "TISHK"*

*-Посол США в Анкаре и консул США в Адане после встречи с курдскими политиками и правозащитниками в Анкаре решили посетить Диарбакир, где намериваются встретится с мэром Османом Байдемиром*

*- Министр по делам территории вне Курдистана Мухаммед Инсан заявил, что 68 тысяч арабов из Киркука изъявили желание покинуть город и переселится в места своего прежнего обитания.*

*- В Сулеймании задержана женщина, которая выдавала себя за дочь Джалаля Талабани и сумела собрать 1,3 миллиона долларов США*

## Ирак разделят по-боснийски?

Американский сенатор-демократ Джозеф Байден предлагает разделить Ирак по тому же принципу, по которому в 1995 году была разделена Босния. Его идея уже встретила неоднозначную реакцию в самом Ираке. Так, представитель входящей в шиитский "Объединенный иракский альянс" партии "Ад-Даава" ("Призыв") Хассан аль-Сенаид назвал предложения Байдена попыткой дискредитировать администрацию Джорджа Буша. "Раздел Ирака отвергают все иракцы", -- заявил он.

Какие же принципы были положены в основу Боснии и Герцеговины (БиГ) в соответствии с договоренностями, подписанными в ноябре 1995 года в Дейтоне? Кстати, идея "дейтонской" Боснии и Герцеговины также принадлежала США. В августе 1995 года ее привез в Европу для ознакомления тогдашний помощник президента США по национальной безопасности Энтони Лейк.

Дейтонская модель предусматривала разделение формально единой БиГ на два равноправных субъекта -- Республику Сербскую (РС, 49% территории) и Мусульмано-хорватскую федерацию (МХФ, 51%). Таким образом, все три главных этноса становились государствообразующими в рамках мягкой конфедерации. Каждый из двух субъектов получал право вступать в особые отношения с соседями -- Югославией и Хорватией.

Высший орган исполнительной власти -- коллективный президиум -- был призван закрепить единство страны и равноправие населявших его народов. В его состав вошли по одному представителю от сербов, хорватов и мусульман, принимавшие решения консенсусом. Создавался и единый парламент, треть депутатов которого избиралась от РС и две трети от МХФ. Третьим элементом обеспечения единства БиГ стали центральные министерства иностранных дел внешнеэкономических сношений, финансов, юстиции и по делам беженцев. Остальные вопросы были отнесены к ведению органов власти РС и МХФ, в которых учреждались посты президентов, создавались парламент и правительство, а также собственные вооруженные силы.

"Дейтонская" модель обустройства Боснии и Герцеговины "стала уникальной и не самой худшей", отметил в беседе с "Временем новостей" директор Института славяноведения РАН доктор исторических наук Константин Никифоров: "За десять с лишним лет международное сообщество так и не создало на Балканах другой модели, способной урегулировать сложные этнические и конфессиональные проблемы региона".

"При доработке эта идея может быть применима и к разрешению кризиса в Косово, и к другим горячим точкам, причем не только на Балканах, но и в Ираке. Переустройство страны по дейтонскому образцу само по себе не ведет к распаду государства. Проблема в том, чтобы не допускать перекосов в пользу того или иного субъекта, не ущемлять представленных им прав", -- заметил "ВН" г-н Никифоров. Ведь, по его словам, "от дейтонской Боснии возможно движение как в сторону большего унитаризма, так и в сторону усиления центробежных сил, вплоть до распада государства".

**Петр ИСКЕНДЕРОВ**

## УНИВЕРСИТЕТ "КУРДИСТАН" НАЧИНАЕТ РАБОТУ

Ректор университета "Курдистан" профессор Аббас Вали сегодня объявил о начале работы современного университета В Эрбиле, преподавание в котором будет вестись целиком на английском языке.

В этом году в университет будут приняты 400 студентов: 320 из них из Свободного Курдистана и других регионов Ирака, а 80 студентов будут приняты из других частей Курдистана и диаспоры. Профессор Аббас Вали родам из Ирана, политолог, специалист по новейшей истории Ближнего Востока. С 1984 по 2004 годы он работал в университете Уэльса. А в 2004-2006 годах преподавал в Стамбуле. Профессор Аббас Вали заявил, что новый курдский университет ставит своей целью дать современное образование студентам по самым высоким стандартам, чтобы выпускники могли использовать полученные знания для строительства современного Свободного Курдистана. Университет "Курдистан" заключил специальное соглашение о сотрудничестве с университетом города Бредфорд В Англии, который предоставит свои программы обучения и будет осуществлять контроль над учебным процессом.

Для поступления в новый курдский университет необходимо три вещи: 1. Необходим диплом об окончании лицея, в котором будут 75% высших оценок 2. Необходимо пройти писменный экзамен по английскому языку, подготовленный университетом Бедфорда 3. Необходимо пройти устное собеседование

Желающие узнать подробности могут войти на сайт правительства Курдистана www.krg.org/articles/article_detail.asp?

## TƏBRİK EDİRİK



**Dəyərli Siyabənd müəllim. Sizi 50 illik yubileyiniz münasibəti ilə təbrik edir, sizə cansağlığı, uzun ömür, ailə səadəti, xoşbəxtlik və işlərinizdə uğurlar diləyirik.**

**Hörmətlə: "Diplomat" qəzetinin redaksiya heyəti**

**Hörmətli Mürvət müəllim. Sizi ad gününüz münasibəti ilə təbrik edir, sizə cansağlığı, uzun ömür, ailə səadəti, xoşbəxtlik və işlərinizdə müvəffəqiyyətlər arzulayırıq.**

**Hörmətlə: "Diplomat" qəzetinin redaksiya heyəti**




TƏSİSÇİ VƏ BAŞ REDAKTOR:
TAHİR SÜLEYMAN

ÎMTÎYAZ û SERNÎVÎSAR:
TAHÎR SILÊMAN

УЧРЕДИТЕЛЬ И ГЛАВНЫЙ РЕДАКТОР:
ТАХИР СУЛЕЙМАН

Tel: +994 50 352-33-18

Azərbaycan şöbəsinin redaktoru:
NƏRİMAN ƏYYUB
Tel: 050 379-92-93

Xüsusi müxbir:
RAMİZ CƏBRAYILOV

Əlaqə telefonu:
422-38-26

Müəlliflərin mövqeyi redaksiyanın mövqeyi ilə üst-üstə düşməyə bilər.

Ünvan: Bakı şəhəri, 40
S. Mehmandarov küç.
ev 25. mən. 17
*Адрес: Баку 40, пос. Ул. С.Мехмандарова, дом 25. кв.17*
Navnîsan: Baku 40 soqaq
S.Mêhmandarov xanî 25. mal 17

e-mail: diplomat_gazeti@box.az
Şəhadətnamə: N FŞ 005004966
BUSB-un 2 saylı
Sabunçu rayon filialı
VÖEN 1800061582
H/h 438010000
Sifariş: 961
Tiraj: 2500